

Bawer Mekin Ew Mir?

Enahîte Morad

Piştî ew xişm û bêtara ku ji nişke ve bi ser me de hatî , kurê min yê nazdar û delalê dilê min Şêzad bi destên qirêj – gemar û bi xinzî dihate kuştin ! Wa hîngê pî û basik li min şikestin , jiyana di çavên min de bi çûk û vala dibû , mîna laşakî bê giyan dimam ! Tenê hebûn û sekinandina dost , hogir û hevalên partiya wî nemaze hevalên xwendekar ên xoşewîst û hêja hêz didane min ku , li ser lingên xwe bisekinim û pêşewaziya mêvanên şêrê xwe bikim . Lê ez ji agirê dilê xwe re çî bêjim , bi şev û roj tebat û hêmenî nediket dilê min , xem û êşên demê tev li min civya bûn ! Di navbera pêlên xewin û rastiyê de winda dibûm , tu carî nikarim koçbarkirina bijîşkê xwe bipejirînim ,lewrejî her şev li hundirên malê qunc bi qunc min dipeland ! ji pênuş , pirtûk , cilên wî dipirsîm ?.

Min bi dengê bilind ,banga xwe, li wî dikir û digot : Şêrê min qurbana te bim, çima nivîn û yataqa te vala ye, wey xalî li serê min ,ku tu bi hêsanî ji min dizyane, hîngê har û dîn dibûm , min hêvî û tika dikir ku, ev serpehatiya derew û xewin be !

Vêca jî, ta çilrojîyê rewş û halê min ev bû, rojekê bavê Sêro, ji min re digot : Diya Şêzad, vaye çelroj e, di ser wa bûyera bêbexet û nemirovane re dibore, Pêwîste em biçin gund û çelê kurê xwe li dar xin . Wisan jî, me berê xwe dida gundê Elemdara û amedekar li benda heval û hogirên wî yên xoşewîst diman , lê hê jî min bawer nedikir ku Şêzadê min koçbarkirî, ango herdem pêjin û xeyala wî li pêş çavên min diçû û dihat, jiyana bîranînên wî hêz didane min,ku bi hêviyên zor bilind, li benda mêvanên Şêrê xwe dimam ?.

Roj şemî -23-Avdarê -2012 ê zayînê,li kat yek nîvroj, dema dengên hevalên wî li guhên min diketin, hîngê min temaşe dikir,

ku ez çî bibînim hevalên bijîşkê min mîna refên kevokan , li dirêjahiya rêka gundê Elemdara, bi cilên rengîn, digel hildana simbola partiya YEKÎTÎ û ala Kurdistanê ya giranbiha, bi yek dengî dirûşmên xwe hildidan û weha digotin : Bavê Şêzad serbilind be , diya Şêzad em tev Şêzad in, Şehîd namire, her û herbijî Şêzad û H.W.D . Di nav dengên wan de, dengêkî pir xweş û zîz xwe, bi dirûşmên balkêş hildida û digot : Her bijî Kurd û Kurdistan, bijî azadî.

Wa hîngê, şêtmayî dimam û di ber xwe de dipeyvîm û min digot : Bi Xwedê, ez ne şaşim,ew çêrok tev derew e ,ev dengê xweş yê Şêzad e, yê çavreşê min e, vaye ew li rex hevalên xwe ye ... Her ku ew nêzîk dibûn, Şêzad bi rûkî li ken berve min dihat û digot : Yadê delala min, vaye ez hatim, çima digirî qurbana te me negirî, ma tu dizanî ku hêstirên te birînên min gur dikin ?!. Tenê kenê te, birînên min dikewînin, yadê agir bi mala dijimin û neyaran keve ku, destên me ji hevdû kirin .

Min mîna kesên sermest, Şêroyê xwe hembêz dikir, bi ken û girî tevlihev jê re digot : Qurbana te me şêro, vaye bêtirî çel rojî ye ,pirsa te dikim lê, tevan derew li min dikirin û digotin, ku Şêro koç barkirî û ew bûye bîranîn !.Lê min ji wan bawer nedikir û herdem li benda hatina te dimam kurê min, bi Xwedê min dizanîbû ku îro tuyê ligel hevalên xwe bî!. Bi rûkî berkenî, bijîşkê min, bersiva min dida û digot : Yadê qurbana te me, dilê xwe rihet bike, ma tu nizanî mirin jiyanê nû ye.. Ez di nava refên nemir û pakirewanên gelê Kurd de cîhekî bilind û bêlikirî digirim ,yên mîna Qadî Mihemed **D.R.(3)**